Hukûmeta nû û dîtinek

Qûnaxa îro ya bizava siyasiya Kurdistanê tê de derbaz dibe û dorhêlê siyasiya Îraqê û herêmî bi taybetî û cîhanê bi giştî, fakterên herî girîng bû ji bo rêkeftina her du partiyên mezin li Kurdistanê,

Şivan Şêxo

Ragehandina hukûmeta Kurdistanê keyfxweşi xiste dilê hemû Kurdistaniyan, ji ber ku eve demeke dirêj e çaverêyî vê rojê bûn, çunku di dîroka bizava siyasiya Kurdistanê de û ji encamê nakokî û neyekgirtina xelkê Kurdistanê gelek ziyan vê ketine û bûye egerê derdeseriya mezin û dîrokzanên kurd egerên pitiriya şikestin û karesat û paşvemanên me vedigerînin bo vê nakokiya di nav xelkê Kurdistanê de, bi taybet di nav bizava siyasiya Kurdistanê de, ji bo nexweşi û derde seriyên din nebin ev rêketin çêbû. Girnigiya vê pêngavê ez di van çend xalan de dibînim:

1- Şerê navxweyî, bi taybet piştî serhildanê, gelek hokar û fakterên xirab û metirsîdar peyda kirin di Kurdistanê de û dûratiyek peyda kirbû di nav xelkê Kurdistanê de û ji hemî aliyan ve û herşeyeke mezin bû li ser hêvî û ermancên gele Kurdistanê de, ji ber hindê bêzarî û dilsarî bibû gefeke mezin li ser bizava siyasiya Kurdistanî hêvî û ermancên gelê Kurdistanê.

2- Qûnaxa îro ya bizava siyasiya Kurdistanê tê de derbaz dibe û dorhêlê siyasiya Îraqê û herêmî bi taybetî û cîhanê bi giştî, fakterên herî girîng bû ji bo rêkeftina her du partiyên mezin li Kurdistanê, pêk

anîna hukûmeta hevpişk ku ji hemû xelkên Kurdistanê pêk bê, cunku herêma Kurdistanê wek bizaveke siyasî layekî girîng û karîgere li dorhêla siyasî û gurankariyên pêş hatî tên kirin li deverê, nexasime di Îraqa nû de û biniyatnana îraqa fediral dîmokirasî, bizaveka siyasiya Kurdistanê stûnekî mezin û tewerekî serkî ne ji bo pêş ve birin û serxistina dîmokirasiyetê û seqamgîr kirina li îraqê û li deverê bi giştî, û bê gûman evê jî pêwistî bi yek girtin û desthilateke bi hêz heye, li Kurdistanê bi pêwistî bi yek gotara siyasî û helwestekî hevpişk heye bo hindê ew rolê karîger bê dîtin û bie fakter bo misoger kirina hêvî û ermancên xelkê Kurdistanê, çunku heta nûke bizava siyasiya Kurdistanê gelek kêse û girftên mezin yên mane li dest de û çareseriyê di gel hukûmeta navendî de bi taybet kêşyên fediraliyê û deverên terîb kirî û ev çende gelek bi zelalî di gotara serokê hukûmetê de hate xwiya kirin ku yek ji bernamên hukûmeta herêma Kurdistanê bo deverên li jêr desthilata hukûmeta navendî wezîrek hatiye danan, ji bo ew dever bê behir nebin ji kar û bernamên hukûmeta herêmê.

3- Weku di bernamê hukûmetê de hatî ji bo xurtkirina sîstemê desthilatdariyê, bi rêve birina sîstemê saziyane bi şêweyekî hevçerx û yasayî û biyatnana jêr xana aboriya Kurdistanê misoger kirina sod wergitinê ji serwet û samnên Kurdistanê bi vê çendê gurankariyên mezin dê bi ser şêwê reng û desthilat û xweşguzariya xelkê me peyda be. Sîstem û şewê rêvebirina desthilatdariyê li welatê me dê asoyê geş û ronak bi xwe ve bibîne, eger sîstem û sazî di welatê me de peyda bû xelk çave rê serkeftina hukûmeta herêma Kurdistanêne, duh hemû hêviya xelkê me ew bû hukûmeta yek girtî were damezirandin û du destihlatî li Kurdistanê ne mînin, belê îro û sibe xelk çave rê serkeftin û pêşve çuna vê desthilatdariyê ye û ev yekgirtine berdewambe û bibe fakterek bo hêvê û daxwaziyên gelê Kurdistanê. Ji layekî dîve serkeftina vê hukûmetê bende bi partî û layenên siyasî yên pişkdar ve û bi pila yekê partî û yekîtî her du alî dibe bi dilsozî û bi vî hesta cemawerî û berpisiyariya xwe ya vê qonaxê hişiyar bin û çi asteng nekevin di riya vê yekgirtinê de nabe tu pişkdar be li heman dem de jî berhelestkar jî bî.

Lê hêvî û daxwazî û xewnên me jî divê ji çarcovê hêz û pêçêbûnê dorhêla me ya Kurdistanî derbaz nebin dive em alîkar û piştevanê hukûmeta xwe bin û ew bawerî bi me hebe bi serkirdayetiya xwe ku gelek bi zelalî û dilsozane kar û bernamê xwe bicih bîne